

RE
S
O
R
S
O
R
GÉR
S
O
R
GÉR
S
O
R
GÉR

DENGÊ ÇEP

Mizgin li miletê cihan

Miletê kurdi qehreman

Aza divin bo herkesi

Bo her miletê li cihan

Karkerin rênçberin

Sosyelist û çepin

Em dema aza bi xwazin

Xweş piling û şêrgelin

&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&

Keç û xortêñ serbilind

Tim dikin xebati rind

Benditi da qet nemini

Ew li her bajar û gund

Karkerin rênçberin

Sosyelist û çepin

Em dema aza bi xwazin

Xweş piling û şêrgelin

&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&

Em weki KAWA egitin

Em weki ZERDEST bi hisin

Roja dijmin va di hati

Rôhê wi em ku derinin

Karkerin rênçberin

Sosyelist û çepin

Em dema aza bi xwazin

Xweş piling û şêrgelin

&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&&


ko em ji destê Kardûxan xelas bû bûn, ew roj ji me re bû bû rojek cejn û şahînetê. 2. Em ji welatê Kardûxan di heft rojan de derbas bûn. Di van heft rojan de bîstekê ji me çekêن xwe dananî bûn. Ezab eziyeta, ko me di van heft rojan de dîti bûn, me ew ne di şerê şahî Ecem, ne jî piştî kuştina Korûş û di wextê perîşaniyê de jî ne dîti bûn Bi xeyala ko ji wan ezeban xelas bû bûn, Yewnanan di bin tîrêjên tav ên germ de bihna xwe dida û kîf dikir.

HEREKOL AzîZAN Hawar 32,4-7.

Hevalên şoreşgêr, serfirazîxwaz û
Pêşverû.

Govara ŞOREŞGÊR hêvidare go hûn wê
Bi pêş bixin û jêre bi nivîsin û
Rêkin ser vê navnişanê:

1000. B E R L I N 10
Postfach 100180



mitarekek ji wan xwest da ko Yewnan bikarin kuştiyên xwe veşerin.

19. Kardûxan pêşnihada Yewnanan qebûl kir, bi şertê ko Yewnan nema gundêñ Kardûxan bişewitînin. Ksênofon jî ev şert qebûl kir. Dema ev mizakere yanî mizakera çekdaniyê çêdibû û dawiya ordiya Yewnanan hêj dikişa û dihate pêş, Kardûxêñ ko ji kumbir û kelhoşkêñ dorê dihatin der, li hev dicivîyan. 20. Yewnan ji xwe digihandin hevalêñ xwe yên ko çekêñ xwe danî bûn. Ji nişkekê ve Kardûxan da ber qîran û bi heyteholê hilkiyane kelhoşke ko Ksênofon hêj jê daneketi bû û ji nû ve kevir li ser Yewnanan gêr kirin. Peyayê ko mirtalê Ksênofon hildigirt jê bi dûr keti bû. 21. Segmanekî bi navê Èrilok baz da û mirtalê xwe li ber Ksênofon girt. Her diwan di ber talda mirtalekî de meşîyan û xwe gihadine ordiwê. 22. Yewnan ji ber Kardûxan kişiyan, gihane hev û ketin xaniyên têr zad û qwit. Di wan xaniyan de ewçend şerab hebû ko xwediyan şerabêñ xwe ber bîr û sarîncêñ çementokirî da bûn. 23. Me kustiyên xwe bi rêberê xwe guhartin. Rêber çû cem xwediyan: Kardûxan jî destûr da, ko em miriyên xwe veşerin. 24. Sibetirê Yewnan bê rêber û rêzan bi rê ketin. Kardûxan dida pey û li wan dixist û carina ji beriya wan diketin gelîyan û rê li wan digirtin. 25. Dema pêşdar disekinî, Ksênofon ji par re hildikişa serê çiyan û bera dijminan dida: ew belav dikirin. 26. Xerîsop ji aliyê xwe ve, gava dijmin dirêj dikir, xwe dida ber û rê ji dimdare re vedikir. Bi vî awayî pêşdar û dimdar li ber dengêñ hev bûn û li hev miqate dibûn. 27. Wextê Yewnan ji bilind-cihêñ, ko hilkiyâa bûn ser, dadiketin jêr, Kardûxan ew gelek têşandin. Gava me dida pey wan jî, me bi wan ne dikari. Carina cihê xwe ne di-terikandin, heta ko em bi temamî nîzingî wan dibûn. Bi tenê ji çar pênc gavan ji ber me radibûn. Lê Kardûx hewqas çist û pêsivik bûn, ko dîsan me ne dikari em xwe bigihînin wan û wan bigirin an bikujin. Kardûxan ji tîrkevan û kuçkaniyê pê ve tu çekêñ din hilnedigirtin. 28. Kardûx tîrkevanîne serdeste bûn. Kevanêñ wan qederê du gaz û nîv dirêj û tîrêñ wan ji gaz û nîvekê dirêjtir bûn. Gava tîrkevanêñ xwe tavêtin, xwe berdidan ser lingêñ xwe ên çepê, werîs ber bi jêr û ber bi xwe ve dikişandin. Tîrêñ wan di zirih û mirtalêñ me re derbas dibûn. Tîrêñ Kardûxan ko diketin destêñ Yewnanan: zolek çerm bi serêñ wan re gi-reididan û wek yadigarekê ew ji xwe re hiltanîn. Di vî welatê çiyayîn de ji xelkê her derê bêtir xelkê Girîtê bi kêr hatin.

3. 1. Di roja heftan se em gihiştî bûn dawiya tixûbê welatê Kardûxan û daketi bûn deşte. Me qerargeha xwe li ber ava mezin danî. Av ji çiyayîn Kardûxan ne gelekî dûr bû. Me di gundêñ deşte de gelek zad û zexîre peyda kirin. Ji ber pirahiya zadê, ko keti bû destêñ me, û ji ber sahiya,

dike. Kirin ne kirin wî hêsrî ji »no« pê ve tu tişt ne got. Rabûn, ew ji pêş çavên hevalê wî ve şerjêkirin. Hevalê wî anîn û jê pirsîn. Ewî got: 24. »Hevalê min ji wê re got ko rêke din nas nake, ji ber ko di van gundan de keçekê wî bi mér e. An ne rêne din hene. Evi Kardûxî soz da Yewnanan ko wan di rêke qenc biborîne, rêke welê ko dewar ji te re bi rahetî bikarin derbas bibin. 25. Ji gotinêr rêber dixuya ko di pêsiya wan de girek heye û heke Kardûx bi wan hesiyan û beriya wan ketine gir, Yewnan wê hew bikarin di ber re derbas bibin. 26. Şêwrek danîn. Herçî zabit û kûmandar û segmanêr bijarte gihane hev. Diviya bû birek esker here pêsiyê û beriya dijmin bikeve wî gîrî û rê bihemîne.

2. 1. Roj diçû ava. Canfedan emrê xwe girti bû. Piştî şivê wê bi rê ketin. Me rêberê gîrêdayî ji sparte wan. Wezifa canfedan ev bû: Ewê bi şev biketan gir û heta spêdê, wê tê de biman. Bi şefeqê ve, bi dengê stirihan, wê işaret bidana ordiwê û dirêjî dijmin. 2. Ji bo vî karî du hezar canfeda hatine bijartin. Baraneke hûr barî. Ji bo vesartina hereketa canfedan û xapandina dijmin, Ksênofo el eskîrên dimdarê li ber riya mezin şargeh bû bû. 3. Newalek diket a me û çiyê. Diviya bû em tê re derbas bibin û bi hewa kevin. Karanji jî jor de kevirine gir û hûr li me gêr dikirin, kevirine girover. Di van keviran de hin hebûn dibûn barê erebekê. Ev kevir gava gêr , li tehtan diketin, dipengizîn, dişeqitîn, dişikestin û wek kevir , aniyê, di hewayê re, bi fikîneke tij, difirîn. Di bin barana van de me nikari bû em nizingî li rê bikin. 4. Em li rêke din digeriya dest ne diket. Heta bi şevê halê me û Kardûxan bi vî karî bû şev. Em ji şargehêr xwe rabûn, me xwe da paş û me şawar. Ji xwe eskerên dimdarê taştê ji ne xwari bûn. Kardûxan bi şev ji dev ji me berneda, kaç û kevir li me gêr dikirin. Me pêjna wan dikir. 5. Canfedayan me bi rêberê xwe ve derbasî çiyê bû bûn. Ji nişkekê ve bi qerekona dijmin de girtin. Kardûxan agir dada bû û di dora wî de rûniş bûn. Bi hatina Yewnanan ne hesiya bûn. Yewnanan hinek ji wan kuştı, hinê din ji ji hevrazan de gêr kirin û ketin şûna wan. Canfedan di dil xwe de digot qey bû bûn raserî dijmin û ji ordiwê re rêke baş temîn kiri bûn. 6. Lê ew ne şas bûn. Di paş wan re kelhoşkek hebû û rê di ber wî re derbas dibû. Kardûxan mifrizekî mezin êxisti bun kelhoşkî û kiri bûn. Digel vê hindê di neqeba girê ko keti bû desten Yewnanan û vî kelhoşkî de Miyek hebû. 7. Kardûx bi şev di gir de beyitîn û bi sibî ve bê deng û pêjin dane rê. Miji girti bû ser erdê. Kardûx û Yewnan ne dixuyan. Yewnanan nizingî li Kardûxan kir û dema ko bi dari in, borîzanın.

li boriyên xwe xist û Yewnanan bi zirt û fortan dirêjî Kardûxan kir. Kardûxan xwe ne girt, ji cihê xwe rabûn û revin. Ji ber ko gelek çist û çalak bun, Kardûxan xwe bi lingên xwe xelas dikir û kêm dihatine kuştin. 8. Xerîsog gava dengê borîzanan kir, bi eskerên xwe ve û di riya mezin re ajote pêş. Kûmandarên din dane rê û şivereyên ko diketin pêşîya wan. Herkesi bi awakî qesta çiyê dikir û hildikişa ser. Hinekan rimên xwe paş xwe ve dirêj dikir û hevalê xwe kaş dikir. 9. Riya ko rêber şanî me da bû ji bo dewar û barxanê ji hemî riyê din çêtir bû. Ksênofon bi esker û barxanê ve tê ve diçû. 10. Li ser vê riyê mitikek hebû û dijmin keti bû ê. Lê Ksênofon nikari bû riya xwe biguherîne, ji ber ko dewar û barxane nikari bûn di rêke dî ve herin. 11. Yewnanan halan di hev hildan û êrîş kirin. Lê li mitik wer ne hatin û cihekî revê ji dijminê xwe re hiştin. 12. Kardûxan jî dest ne birine xwe, ji mitik rabûn û xwe dane paş. Eskerên me tev da di ber gir re derbas bûn. Lê girekî din diket pêşîya me û tê de dijmin hebû. Yewnanan dil kir wî girî ji mîna girê pêşîn bi êrîşekê bibin û riya xwe vekin. 13. Ksênofon pê qail ne bû; ji ber ko esker tev da dirêjî wî girî bikira, hebû ko Kardûx vegeerin girê ko dihî lê bûn û ji par re li barxanê xin. Ji xwe ji ber tengiya rê dewar yeko yeko da bûn pey hev û barxane bû bû karwanekî dûdirêj. Ksênofon di bin fermandariya sê zabitên heja, Kefisodor, Emfikrat û Erxegoras de birek esker di girê pêşen de hişt û bi eskerê mayîn ve dirêjî girê din kir û ket ê. 14. Di pêşîya gir de kelhoşkekî asê hebû û Kardûx tê de şargeh bû bûn. 15. Ksênofon nîzingî lê kir. Kardûxan, bêî ko dest bibin xwe, kelhoşk heliştin û baz dan. Yewnanan lê ecêbmayî man û di dilê xwe de gotin qey çavên dijminên xwe şkînandine û Kardûx yekcar ji desthilanîne ketine. Yewnan şaş bun, dixapiyan: çavên Kardûxan ne şkiya bûn. Kardûxan tiştê ko di dimdarê de çebû bû tev de diti bûn, xwe ji kelhoşkî da bûn paş û dikirin ko li girê pêşîn bêne wer û li dimdarê xin. 16. Ksênofon digel eskerên xwe ên ciwantır hilkişa bû ser kelhoşkî û talûkê bi çavên xwe diti bû. Ksênofon emri eskerê xwe kir ko hêdi hêdi bimeşin da ko ên bişûndemayı bikarin xwe bigihînin wan û gava li hev civiyan, diviya bû esker tev de xwe bidin erdekî rast û bikevin qora şer. 17. Ksênofon hêj emrê xwe ne qedandî bû ko Erxegoras ji nişkekê ve lê der bû û got ko Kardûxan bi êrîşekê ew ji gir rakirî bûn, Kefisodor, Emfikrat û heçî, ko nikari bûn xwe ji zinaran de çeng bikin, hati bûn kuştin.

18. Kardûxan piştî ko zora Yewnanêñ girê pêşîn birin, pey hev gir û mitikên din jî rakirin û ketin pêşîya kelhoşkê ko Ksênofon bi xwe lê bû. Ksênofon bi wasta dilbendekî (tercimaneki) deng li Kardûxan kir û

bûn ser Yewnanêñ ko ji par re ma bûn. Kardûxan ew bi tîr û kevan û kevir kuştin, hinek jî birîndar kirin. Ji xêra xwedê re Yewnanêñ, ko ji par re ma bûn hindik bûn. 11. An ne bireki ordiwê i mezinbihata şerjêkirin. Bi şev em di gundan de man. Kardûxan li ser çiyan agir dada bû. Me guhdariya hev dikir.

12. Bi şefeqê ve herçî zabit û kumandar gihane hev û qerar dan ko barxana ordiwê sivik bikin û hêşîrên ko vê paşiyê hati bûn girtin, berdin. 13. Ji ber ko qelebaliixa hêşîr û dewaran em aciz dikirin. Eskerên ko li wan miqate dibûn nikari bûn şer dikin. Hêşiran nanê me jî dixwar. Li ser vê qerarê ji dewarên baş herçî ko ji me re diviya bû, me ew ji xwe re bijartin û ên mayîn berdan. 14. Pişti taştiyê ordû bi rê ket. Rojê pê de em meşîyan. Me carina şer dikir, carina jî me bihna xwe dida. 15. Sibetirê bapûkek li me qelibî. Digel vê hindê diviya bû em bi rê ve herin, ji ber ko zadê me ne ma bû. Xerîsif da bû pêşiyê, Ksênofon di dimdarê de ma bû. 16. Kardûxan derbeke xurt li me da. Kardûxan nîzingî li me dikir û kevir û hesin li me dibarandin. Yewnanan dida pey û ji par re dikişîyan. Bi vi awayî em ji rûveçûnê diketin. Gava dijman li me dişidand, Ksênofon eskerên xwe disekinand û şargeh dikir. Me elam dida Xerîsif: wî jî eskerên xwe disekinand. 17. Lê carekê Xerîsif li şûna ko bisekîne, xwe werlezand ko ji adetê der ji me bi dûr ket. Bivê nevê tiştek li wan qewimî bû. Lê Ksênofon nikari bû here pêşiyê û seh bike. Dîmdar jî bêgav ma û lez da xwe. Bi awakî welê ko meşa me bû bez û rev.

18. Di vê navê de segmanekî hêja, Kléonîm, hate kuştin. Tîrek li kèleka wî keti bû. Tîre mirtal û kirâsê wî i çerm qul kir û ji par re aveti bû. Segmanekî din, yekî bijarte, bi navê Basyas jî hati bû kuştin. Tîrek di serê wî re çû bû.

19. Gava em gihiştin cihê ko em lê bimana, Ksênofon bi lez çû cem Xerîsif û gazind jê kirin. Ksênofon gote wî ko bi vê lezandinê dîmdar mecbûr bû hem bi rê ve here hem şer bike. Dîsan ji ber vê lezandinê Yewnanan cendekên du peyayêñ hêja jî li erdê hiştî bûn bêî ko bikarin wan veşerin. 20. Xerîsif lê vegerand û got: »Tu van çiyayêñ asê dibîni? Mirov di şer destê wan re nikare here. Divêt em xwe li wan biqelibinin. Tu vê riyê dibîni, jû pê ve tu re nîne ko em tê re bikarin derbas bibin û ji vê derê xelas bibin. Ev jî rêke zehf asê û nexweş e. Ji ber vê yekê min xwe lezand û ez li hêviya te ne mam. Min xwe ne lezanda hebû ko dijmin beriya me biketa bilind cihan û rê li me bigirta. Rêberên me bi xwe dibêjin ko ji vê pê ve tu rê nînin. Ksênofon gote Xerîsif: »Bi min re du hêşîr hene. 22. Her du ji xelkê vê derê ne, em carekê ji wan jî bipirsin. Hêşîr anîn û ew ji hev dûr xistin û ji ê pêşin pirsin heke rêke din nas

35. *Kardûx û welatê Kardûxan*(Xénophon, *Anabasis III, 5-IV, 3, 2.*)

III. 5

1. Eskerê Ksênofon xwe gihandi bû bilinçihan û raserî dijminan bû bû. Eceman xwe dida paş û diketin rêke din. Xrisof — kumandarekî yewnanî — bi eskerê xwe ve daketi bû deşte, eskerê xwe li gundêñ têrzad û zexîre bi cih dikir. 2. Piştî nîvro dijmin ji nişkekê ve daket deşte û li me der bû. Kardûxan Yewnanêñ, ko ji ordiwê dûr keti bûn û da bûn pey talên, kuştin. Li hire me gelek pez, ji pezêñ ko şivanan dikir li avê derbas bikin, standin. 3-5. Eceman gava dit ko em zadê xwe ji gundan dibin, rabûn, agir berdan gundan, Ksênofon digot: Em herin arîkariya gundiyan û nehêlin ko gundêñ wan bişewitînin». 6. Lê Xerîsof ne di vê fikrê de bû. Yewnan gotina Xerîsof di ser gotina Ksênofon re girt û wan jî dest bi şewitandina gundêñ Kardûxan kir.

IV. 1

4. Lê ji ber ko Yewnanan nikarî bû di Diclê re derbas bibin, berê xwe dan çiyayêñ welatê Kardûxan. 5. Tevdîra me ev bû, ko em ji ker ve ji deşte rabin û beriya dijmin xwe bigehînin bilinçihan. Ji xwe ji şevê kotekî ew zeman ma bû, ko em bêî ko bêne ditin ji deşte derbas bibin. Me emrê barkirinê da û bi spêdê ve em gihane çiyê. 6. Xerîsof digel firqe û segmanêñ xwe ên sivik keti bû pêşiyê. Ksênofon di dimdarê de ma bû û pê re tu segmanêñ sivik nîn bûn. Eskerên wî tev de piyadeyêñ giran bûn. Ji ber ko Yewnanan mihtemel ne didît ko Ecem bidin çiyê, ji par re li wan digerin, bidin pey û li wan xin. 7. Xerîsof, beriya ko Kardûx pê bihesin, digel eskerê xwe giha bû pehnava çiyê. Ordîwê dida pey. Bi vî awayî em gihane gundêñ ko di newal û di gérâan de bûn. 8. Kardûx gava bi me hesiyan, ji gundêñ xew rabûn û digel jin û zarowêñ xwe berê xwe dan çiyan. Di gundêñ Kardûxan de me gelek zad û zexîre ditin. Xaniyêñ Kardûxan bi kiloz û dizikêñ tinc û sifir xemilandî bûn. Yewnanan dest ne dane wan, û ne ketin pey Kardûxan ko direvin. Ji ber ko me di dilê xwe digot: »Heke me bi wan xweş kir, heye ko em ji welatê wan bê teq û req û bi awakî dostane derbas bibin. Ji xwe Kardûx bi xwe neyarê şahê Ecem bûn. 9. Lê Yewnanan herçî zad û zexîre ne, tev de dibirin ji ber bêgaviyê. Kardûxan guh ne da xweşkirina Yewnanan û tu rûyê dostî û aşiyê şanî wan ne dan. 10. Dimdar heta bi tariyê di cihê xwe de ma û bi şev dakete gundan. Ji ber ko rê gelek teng bû, bi hewa ketin û dahatin rojekê ajoti bû. Hinek ji Kardûxan giha bûn hev û ajoti

35. *Kardûx ú welatê Kardûxan*(Xénophon, *Anabasis III, 5-IV, 3, 2.*)

III. 5


1. Eskerê Ksênofon xwe gihandi bû bilinçihan û raserî dijminan bû bû. Eceman xwe dida paş û diketin rêke din. Xrisof — kumandarekî yewnanî — bi eskerê xwe ve dakteri bû deştê, eskerê xwe li gundêñ têrzad û zexîre bi cih dikir. 2. Piştî nîvro dijmin ji nişkekê ve dakter deştê û li meder bû. Kardûxan Yewnanêñ, ko ji ordiwê dûr keti bûn û da bûn pey talên, kuştin. Li hire me gelek pez, ji pezêñ ko şivanan dikir li avê derbas bikin, standin. 3-5. Eceman gava dît ko em zadê xwe ji gundan dibin, rabûn, agir berdan gundan, Ksênofon digot: Em herin arîkariya gundiyan û nehêlin ko gundêñ wan bişewitînin». 6. Lê Xerîsif ne di vê fikrê de bû. Yewnan gotina Xerîsif di ser gotina Ksênofon re girt û wan ji dest bi şewitandina gundêñ Kardûxan kir.

IV. 1

4. Lê ji ber ko Yewnanan nikarî bû di Dielê re derbas bibin, berê xwe dan çiyayêñ welatê Kardûxan. 5. Tevdîra me ev bû, ko em ji ker ve ji deştê rabin û beriya dijmin xwe bigehînin bilinçihan. Ji xwe ji şevê kotevê ew zeman ma bû, ko em bêî ko bêne ditin ji deştê derbas bibin. Me emrê barkirinê da û bi spêdê ve em gihane çiyê. 6. Xerîsif digel firqe û segmanêñ xwe ên sivik keti bû pêsiyê. Ksênofon di dimdarê de ma bû û pê re tu segmanêñ sivik nîn bûn. Eskerêñ wî tev de piyadeyêngiran bûn. Ji ber ko Yewnanan mihtemel ne didît ko Ecem bidin çiyê, ji par re li wan digerin, bidin pey û li wan xin. 7. Xerîsif, beriya ko Kardûx pê bihesin, digel eskerê xwe giha bû pehnava çiyê. Ordiwê dida pey. Bi vî awayî em gihane gundêñ ko di newal û di gêran de bûn. 8. Kardûx gava bi me hesiyan, ji gundêñ xew rabûn û digel jin û zarowêñ xwe berê xwe dan çiyan. Di gundêñ Kardûxan de me gelek zad û zexîre ditin. Xaniyêñ Kardûxan bi kiloz û dizikêñ tinc û sıfir xemilandî bûn. Yewnanan dest ne dane wan, û ne ketin pey Kardûxen ko direvin. Ji ber ko me di dilê xwe digot: »Heke me bi wan xweş kir, heye ko em ji welatê wan bê teq û req û bi awakî dostane derbas bibin. Ji xwe Kardûx bi xwe neyarê şahê Ecem bûn. 9. Lê Yewnanan herçî zad û zexîre ne, tev de dibirin ji ber bêgaviyê. Kardûxan guh ne da xweşkirina Yewnanan û tu rûyê dostî û aşiyê şanî wan ne dan. 10. Dimdar heta bi tariyê di cihê xwe de ma û bi şev daktere gundan. Ji ber ko rê gelek teng bû, bi hewa ketin û dahatin rojekê ajoti bû. Hinek ji Kardûxan giha bûn hev û ajoti

hêrîşên mérani, tisi şérén ne li gora hev û bi
hejêkirna çêlikên xwe di hesiya. Gomanên wê, ên
dawî di wan ve bûn, divabû wan bi xwarin dê,
wan têr kê, dilkên wan di cih kê. Heye rovik
wan bibinê, wan bikujê. Çêlikên wê hê li dora
hestû diçûn û dihatin, dikûzîn. Gurê xwe kisa-
nd cem çêlikan, cihê bi xwîn ji lingê xwe xi-
ste devkê wan...êdi serê xwe danî û çavêن xwe
girtin...stêrên go di gelek şevan de rînasê wê
bûn, kori bûbûn. Ba ko carê ji dûr vebihna
nêçirêن wê jê re tanî, bê pêjin bûbû. Jîn gîş
ko mala wê i bê qeyd bû, tarî bûbû û di pêlê
kûrbûnê de winda bûbû. Di vê tariyê de dirêj
kiri bû, bi xweşî... bi xweşî dihesiya ko laşê
wê parce parce diçê devkêن zarokêن wê de û jî-
na wê diherikê jîna wan.

Hatiye wergerandin ji
Literatûra BULGARI



miletê Kurd heyf hilîne
wê te bike ker bi ker
çimkî tev mîna Mihemed canfîda û bi ceger
milet û part û tarîx
ku li ser kirne këser.
da werin rêça Mihemed yek bi yek em bibne ser

geli cîhan hûn bizanin ku ewaya

li kuye ?

ew çûye da ku bibîne, çî di rêçêde

heye ?

da hilîne ew di wirde lempeya

Azadye

bike ronî şopeya miletê xweyî

Kurdiye

rêça mîrxas û egîta û pilingan

her weye

Dijminê bêbext

û dijwar

te ci kir ?

te bi kuştina hevala

miletê Kurd jinde kir

RÊÇA MIHEMED HESE

Hêsrê çavan her bibarî

her bibarî

her bibarî

nabe qinyatî ji min re ku Mihemed

ew tu carî

ew ji vê jîna sitemkar bi temamê

xwe heri

destê wî çimkî ji destên van çepan

qet nabiri

bo hevala wî dihişte rewşê hêja

û piri

gorîbûn û rastgobûn û paqijî

û perwerî

Bûye winda nedixwazin bibe winda û çuye